



# T Ê K O Ş E R



Hejmar 28

Hezîran 1985



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

**TEKOŞER:** KOVARA TEKOSER, YEKİTIYA KARKER Û XWENDEKAREN KURD LI BELÇIKA

**NAVNIŞAN:** B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

**BUHA:** 40 F.B., 2 DM, 6 FF.

**N° BANKE:** 426-3144071-85

K.B. - BELGIQUE

**BERPIRSIYAR:** M. Nezh YALÇIN

**KOMİTA NIVİSKARIYÊ:** Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

## T E D A Y I


ÇEWTI .....	R. 3	
SE TARIXEN HAWARE .....	Celadet BEDIR XAN .....	R. 4
TIRKIYE LI PARLAMAN Û KONSEYA EWRUPA .....	R. 6	
REZIMANA KURDÎ .....	Celadet BEDIR XAN û Roger LESCOT .....	R. 8
SIMINAREK SER SİNEMA KURDÎ .....	Redwanê ALI .....	R.10
1915-1916: ERMENI KATLIAMI .....	Pervin .....	R.13
DİROKA KURDISTANÊ DI ANSİKLOPEDIYA ISLAME DE .....	R.14	
NAVÊN KURDÎ .....	Ferzend BARAN .....	R.18
REZANA VEGERANDINA BIYANIYAN .....	Derwêş .....	R.20
XEBATA ME .....	R.22	
TEKOŞER'DEN HABERLER .....	R.23	

# Ç E W T Î

Di hejmara dawîn a kovara me de, me du çewtiyên giran kirin. Loma em wan li vira tînin ber çavên xwendevanan û hêvî dikin ku ew ji bo vê yekê me bibuhurin:

1- Rûpel 9-12: Çîroka Muxtêr, a Firat Cewerî. Diviya ku rûpel 11 cihê rûpel 10 bigirta, û rûpel 10 cihê a 11 bistenda. Em hêvî dikin ku hûn vê çîroka hêja ji nuh de bi vî awayî (ango, rûpel 9, 11, 10, 12) bixwînin ku hûn baş têbigihêjin rêzaya (mana) wê.

2- Diviya ku hejmara kovarê 27 biba, ne 26.



# SÊ TARÎXÊN HAWARÊ

15 Gulan 1932

18 Tebax 1935

15 Nîsan 1941

Celadet BEDIR XAN (\*)

Ji ber ko Hawar di panzdehê Gulana sala hezar û neh sed û sih û didowan de hatiye dinyayê, di panzdehê vê Gulanê de diviya bû Hawar bibe nehsalî. Lê ji ber ko Hawar ji hejdehê Tebaxa sala hezar û neh sed û sih û pêncan heta panzdehê vê Nîsanê şev û roj û şeş salan pêde razaye û ji ber ko demên xewê, xewên rojê, di heyîna heyberan de nayine hesêb, Hawar îro bi tenê nûzake sêsalî ye.

Di jiyîna Hawarê de sê tarîxên bîraver hene. Me ew tarîx di bin sernama vê bendê re şanî dan.

## Tarîxa pêşîn

15 Gulan 1932. Di vê tarîxê de gazî û hawara Kurdan ji dil û devê wan ketine nav xêz û xêzikên çend rûpelan û kovareke kurdî anîne pê. Ji Kurdan re Hawar, Hawareke nû, Hawara zanîn û danzanîne za.

Ev roj di jiyîna Kurmancan a civakî û edebî de rojêke tarîxî ye. Di vê rojê de Kurdmamc bûn xwediyê elfabêke biserxwe, elfabêke kurdî û ji nîrê elfabiyên miletên din, milletên biyanî xelas bûne.

Ev elfabê alek e, ala biserxwebûna heyîna me a edebî ye.

Berê di ser keleha me a edebî re alên biyaniyan li ba dibûn. Di vê rojê de Kurdmancan ew al daxistin, çirandin û li şûna wan ala xwe a milî daçikandin û ji hêsiriya wan bandêran filitîn, xwe dan ber siha bandêra xwe û di vê qadê de bûne biserxwe.

Belê, elfabiya ko ji sala hezar û neh sed û nozdehan ve ez lê dixebitîm, min ew di wê rojê de, di rûpelên Hawarê de belav kir.

Kurdmancên ko pê hesiyan û hînî wê bûne îro zmanê xwe bi elfabiya xwe a milî û bêî tu dişwariyê dinivîsînin û kovar û kitêbên ko ketine çapê bi kêfxweşî di-xwînin.

## Tarîxa duduyan

Lê Hawarê gelek dom ne kir. Hejmara wê a bîst û şeşan di 18ê Tebaxa 1935an de belav bû û ji hingê ve Hawar nema derket.

Lê hîmê xwendin û nivîsandinê, elfabê belav bûbû û piştî razandina Hawarê jî gelek û hergav nebin jî carcara hin kitêb

(\*) Kovara Hawar, hejmar 27, 1941, r. 4-5

4

diketin çapê û digihan destê kurdmancan.

Di wan salan de ji kurdên ko bîrewerê heyîna xwe ne û di dilê wan de rûmeta millet û welêt heye bi hînbûna xwendin û nivîsandina zmanê xwe xebitîn û zanîna xwe pêş ve birin. Ew ne bi tenê xebitîn û elimîn, lê xebitandin û elimandin jî. Belê ew ji vî milletê bêdibistan re bûne dibistan, dersa welatîyên xwe gotin û ew gihandin; ji wan mirovên nezan mirovine xwenda anîne pê.

Lê yên ko xwe, bi gotinê, Kurdên qenc û welatparêz dihesibînin wextê xwe bi kurt û pistên pûç û vala derbas kirin û ji lewre hêj (e) û (ê) ji hev ferq nakin. Lê ew bi zmanê biyaniyan û hinekê wan bi çendekan dizanin, û hin hene ko di wan zmanan de xwenda û zanayîne xurt in jî. Lê bi zmanê xwe ê mader, bi vî zmanê şêrîn û delal, bi zmanê da û dapîr, bi zarê kal û kalikên xwe nizanin.

Mirov dibêje qey ji bin hikmê bandêra biyaniyan naxwazin derkevin û hêsîrî bi wan şêrîn e. Heke welê ye, divêt rayekî biyaniyan di wan geriya be. Rakî welê ko bi dizîka bi wan ve bûye. Herwekî şairê sorî gotiye:

Her kesî kurd naseraw bî hez be bonî kurd  
ne ka  
Pirsiyarî daye ley ka ta le babî xoy biga

Belê ew bi zmanê xwe ê mader nizanin. Ew zmanê ko xwendin û nivîsandina wî ji her zmanî hêsantir e. Min bi xwe ceribandîye, kurdekî nezan, li gora şehrâziya xwe di wextekî gelek kurt da hînî elfabiya xwe dibe; ji pênc heta sih rojî.

Malxirabino! ma we ewçend wext nîne, hon ko ji bo hînbûna zmanên biyaniyan bi salan ve xebitîne û îro jî dixebitin, ji bona ko bikarin "fînfoneke" derewîn bi lêv bikin.

Kuro eyb e, şerm e, fehîr e. An hînî zmanê xwe bibin, an mebêjin em Kurd in. Bê zman Kurdîti ji we re ne tu rûmet e, ji me re rûşêike giran e.

Pesn û şabaş û hezar pîroz ji wan re ko hînî xwendin û nivîsandina zmanê xwe bûne û bi vî awayî mifta heyîna xwe xistine bêrîka xwe û ji bin bandêra milletên biyanî bi der ketine.

Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze

ji wan re ko bi zmanên din dizanin bixwînin, binivîsin û elfabiya zmanê xwe hêj nas nakin.

Lê ji bo hînbûnê tucaran wext ne dereng e, û wextê hînbûnê li tu kesî nabore.

Yên ko bi elfabiya zmanê xwe nizanin, lê bi zmanên din gelek dizanin, divêt bizanin ko ev elfabê rojekê, ji wan dê bête pirsîn.

Lê kes nizane heke ew roj dûr e an nîzing e.

Hingê bibêjin jî emê bielimin, li wan dê bête vegerandin: Me hêvî hebû em di te de mamostekî peyda bikin ne şagirdekî.

Xwendevanino, bi kurtî eve dîrokiya heft salên bêhawar, wek heft salên xelayê bê av û bê baran.

### Tarîxa sîsiyan

Panzdehê Nîsana sala hezar û neh sed û çel û yekê ye, yanî îro ye.

Hawarên pêşîn, her bîst û şeş Hawar xebitîne kurdmancan hînî elfabiya wan bikin. Herwekî me li jor got, Hawar di nav miletê xwe ê bêdibistan de, kêr û zêde karê xwe bire serî.

Hawar dîsan dê bixebite û tiştêkî din jî bi ser ve zêde bike: **Gramêr**.

Di Hawara pêşîn de min elfabiya xwe belav kiri bû. Di vê hejmarê de ezê dest bi belavkirina gramêra xwe bikim. Ev di zmanê Kurdmancî a nivîskî de gaveke nû ye. Ji xwe hîmê zmanekî li ser sê hêmanên bingehîn sekiniye: elfabê, gramêr û ferheng. Me elfabê belav kir, îro jî dest bi belavkirina gramêrê dikin, ko Xwedê hez kir ferheng jî li pey e.

Em niho hinek bi gramêrê, bi gramêra zmanê xwe mijûl bibin. Gramêr çi ye? Gramêrzanan gramêr bi awayên têvel tarîf kirine. Bi kurtî gramêr tevayiya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zmên e. Ev qeyde bi xwe jî zmên têne der. Belê herkes bi zmanê xwe ê mader bêî ko bide eqlê xwe rast daxêve. Ev rastî bi hin qeydan tête pê û mirov dema xebirdanê de bêî ko bizane bi wan ve diçe.

Gramêrzan li van qeydan hûr dibin, van ji hev derdixînin û diseniffînin. Tevayiya van qeydan gramêr bi xwe ye.

Em bèn ser gramêra zmanê Kurdmancî. Gramêra ko ez îro di Hawarê de belav dikim, min bingehên wê di sala 1929an

de li Hesîçê danî bûn. Ji hingê ve ez lê dixebitim. Pêrar min gramêreke dibistanî digel hînek û wezîfan çêkiri bû. Bi destpêkirina şer min nikari bû ez wê bigihînim çapê.

Lê ji milê din hewcedariya me bi gramêrê roj bi roj bêtir dibû. Xortên ko hînî xwendin û nivîsandinê dibûn, dihatin û li qeydeyên zmanê xwe dipirsîn, gramêrek dixwestin.

Di vê navê de me destûra derêxistina Hawarê ji nû ve stand. Hingê min dest bi senifandina gramêreke din kir. Ne gramêreke dibistanî, lê bingehên qeydeyên gramêra Kurdmancî. Îro ezê gramêrê di Hawarê de belav bikim. Ji milê din min kitêbeke kiçik bi navê "Kitêba Sînemxanê" nivîsandi bû. Ev kitêba kiçik ji bo zarokan gramêreke piçûk e. Heke min pêk anî ji Hawarê pêve ezê eva ha jî bidim çapê.

Ev bend ji alîkî dîrokiya Hawarê, ji aliyê din pronivîsa xebata me ye. Beriya ko ez vê biqedînim, herwekî di destpêkê de min gilî û gazindên xwe ji kurdên zana û nezan kir, di xelasekê de jî ezê wezîfeyên wan ji nû ve pêş wan bikim. Tiştê ko min divêt ez ji were bibêjim, bi kurtî ev e:

Hîn bin, Hîn bin, Hîn bin  
Hîn kin, Hîn kin, Hîn kin

Belê bi tenê hînbûn ne besî me ye. Divêt em hîn bikin jî. Her kurdê ko xwendin û nivîsandinê dizane divêt yên ko nizanin bielimin. Ji kurdê xwenda re divêt, heke ber destên wî de Kurdên nezan nînin, li wan bigere, wan peyda û hîn bike.

Bi hinan hînkirin bi qasî hînbûnê xweş e, heye ko xwestir û bi rûmetir e jî. Belê heke hînbûn berhevkerin û standin e, hînkirin dander û dayîn e. Ji xwe Kurdmanc bi nav û deng in ko destê danê ne.

Belê hîn bin û vê carê ji berê bêtir û çêtir û bi awakî tekûz. Berê di destên xwe de bi tenê elfabê hebû, niho gramêr jî gihaye wê.

**XWEDIYE HAWARE**

# TIRKIYE LI PARLAMAN Û KONSEYA EWRUPA

## PARLAMANA EWRUPA

Di tarîxa 18 nîsan 1985 de, piştî civîna xwe li ser Tirkîyê, Parlamana Ewropa biryareke ku hikûmeta Ankara bi "ajotina kampanyake qetliameke muntezem dijî hindikayiya kurdî" sûc dike, stend. Di vê biryarê de jî, Parlamana "rawestandina hikmê îdamê ku provokasyoneke dijî dîtina navnetewî ye" û ku "hêrsa wê ya rast tîne" xwest.

## KONSEYA EWRUPA

Lê, piştî heftekê, Meclisa Parlamana ya Konseya Ewropa, berê ku dest bi munaqesê li ser rewşa îroyîn a Tirkîyê bike, biryar stend ku nûnerên Tirkîyê tê de bîmînin û ku civîneke piçûk di 1986 de, li Tirkîyê, çêbibe.

Ev biryar rêaksyonên xurt di nav parlamanterên pêşverû de derxistin. Li gel vê qasê, çêkirina vê civîna piçûk li Tirkîyê ji aliyê 59 parlamanter hat pejirandin. 49 dijî vê biryarê derketin û 3 bêdeng man.

Di babeta (konu) zordestiya xusûsî

dijî gelê kurd û hindikayiyên etnikî, parlamanterê fransîz, Dreyfus-Schmidt, û ê austurî, Hesele, bi xurtî peyivîn.

## GIRTINA NIVISKAREKÎ KURD LI TIRKIYE

Nivîskarekî kurd di sala 1975 de, piştî ku ji sedema kurdîtiyê hati bû girtin, li Norvêj iltica kir. Di 1982 de, cinsiyeta norvêjî stend û navê xwe guherand û kir Alexander BERTELSEN. Di sebata 1984 de, ew vegeriya Tirkîyê ji bo dîtina diya xwe. Di 15.2.84 de, ew li Tirkîyê hat girtin, ji bo ku li Norvêj, di 1979 de, wî pirtûkekê li ser Kurdan "Kurd, gelekî li Rojhilata Navîn", tevî nivîskarekî din, nivîsî bû.

Ji bo hikûmeta Tirkîyê, nivîsîna vê pirtûkê cinayeteke dijî zagona Tirkîyê ye. Di 12.3.1985 de, jê re 5 sal girtin û salek û heşt meh hicreta hundurî dan.

Gelek parlamanter, bi hêzanî a norvêjî, Aasen, li Konseya Ewropa, di eynî civîna 23.4.85 de, dijî vê biryarê derketin (li nama wan a bi inglîzî binêre).

## Birayê Delal

Bareş BATTE

Serê min diêşî, birayê delal.  
Nav û hinavên min di nalin  
Jana min pire, birayê delal.  
Dijîm li ser çiyayê Siwêdê  
Li nav daristanê wek lawiran  
Bêziman, bêgoman û bêhêvî  
Ketim destên biroqratan,  
Mîna parsekên Hindistanê.  
Ez tîm ji dûr, ji Kurdistanê  
Bi zorana Osmanîyan bav û kalên min  
Berdan cî û warên xwe ...  
Ez jî ravîm ji ber Tirka  
Nebûm Tirk piştî ewqas sal.  
Naçî ji min tirsaromîyan,  
Nebûm Tirk û nabim Siwêdî.  
Derdê min pirin, birayê delal.  
Têna bîra min zar û zêç  
Naçî ji bîra min welatê min  
De were em bi hev re bigerin  
Li ser vê ecêbê, vê kembaxê  
Li welatê xerîbîyê, birayê delal.



# COUNCIL OF EUROPE

---

# CONSEIL DE L'EUROPE

23 April 1985

Doc. 5398

## PARLIAMENTARY ASSEMBLY

WRITTEN DECLARATION NO. 126

on the case of Mr Alexander Bertelsen,  
imprisoned in Turkey

The undersigned members of the Assembly,

1. Stressing that respect for human rights is of vital importance to international co-existence and peace, and constitutes a basis for the existence of the Council of Europe and for membership in this organisation;
2. Noting that Turkey, a member of the Council of Europe, is a signatory of major international instruments guaranteeing fundamental human rights and freedoms, inter alia the European Convention on Human Rights;
3. Deeply disturbed, therefore, by the fact that since 15 February 1984, upon his arrival in Turkey, a Norwegian citizen, Mr Alexander Bertelsen, has been kept in prison, charged with crime against the Turkish Penal Code for his co-authorship of the book "The Kurds. A people in the Middle East", published in Norway in 1979;
4. Noting with deep concern and regret the sentence passed on Mr Bertelsen on 12 March 1985, five years of prison and one year and eight months of internal exile, for circumstances that should in no way be regarded or treated as a criminal offence in any Council of Europe member country, and that has therefore now been appealed against;
5. Urge the Turkish authorities to bring about the early release of Mr Bertelsen and his return to his home country.

Signed: LIED  
AASEN  
APENES  
THORESEN  
SOGN  
STRAND  
SAELTHUN  
FOSSEN  
FRYDENLUND

STEINER  
STOFFELEN  
ELMQUIST  
BUDTZ  
HAGENSEN  
ANDERSSON  
MARTINEZ  
HUGOSSON

Total: 17

# R Ê Z Î M A N A K U R D Î

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (\*)

( Z a r a v ê K u r m a n c î )

- I -

## P ê ş g o t i n a R. L e s c o t

Zimanê kurdî ku ji koma Iranî ye, du zaravên wî yên bingehîn hene, Kurmancî û Soranî, û di wan bixwe de jî gelek peyvikên navçeyî hene. Kurmancî ku gelek caran jê re zaravê Bakurê dibêjin, cihê wî wilayetên kurdî yên Tirkiyê, Sûriyê, Qefqasyê û Bakurê Kurdistana Iran û Iraqê ye. Soranî ku hin jê re dibêjin Baba Kurdî, di qezayên Rojhilata Başûr de, angû, bi hêzanî li navçeya Sileymaniyê, bi kar tê. Ev xarita zimaniya kurt ewê bi nîşandana hebûna Dumilî yan Zaza, ku li Dersîmê û li navçeya Sêwerekê (li Tirkiyê), Goranî ku ber bi hundabûnê diçe, zaravê Ehlê Heq ê dora Kermansahê, li Iranê, temam bibe.

Rêzimana kurdî ku îro em ji xelkê re pêşkeş dikin, zaravê Kurmancî weka zimaneke ku di rojên me de bi awakî tebîî tê peyivîn û zimaneke bêjeyî (edebî) bi kar tê wesf dike.

Ev eser, bi hêzanî, netîca lêgerînine ku ji bîst salan bêtir ji aliyê rehmetî Mîr Celadet Bedir Xan ku di 1951 de wefat kir, hatin çêkirin. Ji malbata mîrên kevn ên Botan, Mîr roleke pêşeng di şiyarbûna netewevîniya kurdî de, piştî şerrê cihanê yê yekemîn, lîst; di eynî zemanî de, ew yek ji zebatkarên bingehîn ên vejiyana çandî ku bi vê tevgerê re çû, bû. Ev bi xêra wî ye ku rêzikên (qaide) zimaneke ku heta wê çaxê pirr kêr lê hati bû gerîn hatin derxistin û tesbît kirin.

Celadet beg ji nuhkirinên (rêform) Mustafa Kemal li Tirkiyê, welatê ku tê piraniya mezin a Kurdên zaravê Kurmancî rûdinên, ilham stand û ji xwe re çêkirina alfabeke bi tîpên latînî kir barê yekemîn. Di dawiya lêhûrnêrinina li ser fonetîka (nivîsîna tîpan li gora dengên ku ji wan tên) kurdî ku bi salan ajot (li Beşa Yekemîn a vê pirtûkê binêre), wî sistemeke pirr nêzîkî ya ku Tirk bixwe bi alîkariya spêşyalîstên navnetewî stendi bûn, ediland. Aleta ku bi vî awayî hat

çêkirin, di cih de li nivîsîn û xwendina kurdî bi awakî mukemmel hat; û li ser de jî, bikaranîna vê aletê ji bo merivên ku bicarek nexwenda ne jî hêsan e.

Ev alfabe, di destpêkê de, di kovara kurdî, Hawar, ku li Şamê ji aliyê Mîr hat weşandin, di eynî zemanî de bi tîpên erebî û latînî (hejmar 1 heta 23, gulan 1932 - tîrmeh 1933), paşê bitenê bi tîpên latînî (hejmar 24 heta 57, nîsan 1934 - tebax 1943), hat tecrube kirin. Paşê, ew ji bo kovar û pirtûkên ku li Sûriyê hatin çap kirin, weka kovara Ronahî ku di eslê xwe de ragihaneke biwêne ya Hawarê (nîsan 1943 - îlon 1944) ye, bi kar hat. Eger ev alfabe bi awakî fermî (resmî) ne li Tirkiyê û ne li Iraqê hatibe pejirandin (qebûl kirin), ew ji hindikayî ve pirr bi kar hatiye û tê gotin ku piştî tecrube-kirina sistemên cihê, ewê hergav (bi awakî daimî) ji aliyê Kurdên Sovyêtîstanê bi kar bibe.

Netîceyên lêgerînen Celadet beg li ser morfolojîya (awayên gotinan li gora zayend "cins", jimar, zeman...ên wan) Kurmancî bûn babetên (konu) gotarên ku bi fransîzî di rêza (sêrî) yekemîn a Hawarê de (N° 16-17-18 û 26), û paşê bi Kurdî di rêza duyemîn a vê weşanê de (N° 27 û ên paşîn) hatin weşandin. Di 1941 de, di dema ku Hawar weşana xwe ku ji 1935 de hati bû rawestandin, ji nuh de dest pê kir, ez li Sûriyê bûm û li Enstituya Fransîzî xwendekarekî hundirî bûm. Min ji Celadet Bedir Xan re hevkarîya xwe ji bo nivîsîna rêzîmaneke mukemeltir, bi fransîzî, pêşneyar kir. Mîr pejirand û me zû karî bû, bi gengaziyên (wasîte) besî, dest bi çapkirinê bikin. Me destnivîsaran hêdî hêdî dida şagirtekî kompozîtor ku ne kurdî û ne fransîzî zanî bû, lê ku bi awakî ecêb xwe "xelas" dikir; 168 rûpel (in-16) bi vî awayî ji çapxanan derketin. Ev rûpel Beşa Yekemîn û fêslên I heta IX ên Beşa Duyemîn a vê pirtûkê temsîl di-kin. Ew, tevî rastkirin û guhartinên

(\*) Grammaire Kurde, rûpel V-IX, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin: Fransîzî-kurdî: Pervîn.



awayiyên pêwîst, di nav vî cildî de hatin dayîn. Feslên X heta XX ên Beşa Duyemîn ber bi qedandinê bûn gava ku, ji bo berdana Şamê, di îlona 1944 de, ez hatim bang kirin. Ji wê çaxê û heta demeke dirêj, mijûriyên din ez ji lêhûrnêrînan kurdî dûr xistim. Di eynî zemanî de, rewşa Sûriyê hevalên min mecbûr kirin ku weşanê rawestînin.

Min bitenê di dema dawîn de karî bû dosya vê rêzimanê ji nuh de vekim û dest bi qedandina wê bikim, ji bo bîranîna Mîr Bedir Xan û ji bo ku meywa (fêkî) xebata wî tu hunda nebe. Rola min, di vê merhela dawîn de, ya esereke ku me bihevre dest pê kiri bû û ku min bitenê qedand, edilandina tiştê ku bi pejirandina nivîskarê yekemîni hati bû nivîsîn (ango nêzîkî feslê XXîn), û pêkanîna giştî ya mayiya Beşa Duyemîn û ya Siyemîn (Syntaxe: awayê ku pê gotin tên kom kirin ji bo avakirina hevokan "cumle"), e.

Eger di vê eserê de çewtî yan kêmasî, bi hêzanî di feslên ku hevalê min ê rehetî Celadet beg nikarî bû li wan ji nuh de binêre, hebin, hemî pirsiyarî li ser min e.

\*\*\*

Dimîne ku em çend gotinan li ser ramanê bingehîn a vê rêzimanê bêjin. Amanca me ew bû ku em dest bi jimartineke (sayim), ku ji destê me çiqas bê mukemmel be, ya xusûsiyetên Kurmancî bikin, û di eynî zemanî de, pirtûkeke fêrkirineke pratîk ji xwendevanan re pêşkeş bikin. Mijûrbûna me ya duyemîn rêzbûna danasiya kurt (exposé) ku carna tê stendin dide nasîn. Bi vî awayî, pronavên (zemîr) **kesîn** (nîşe: ez diçim), **ên bîrdar** (tu **xwe** diêşînî) û **ên hevdudîtîyê** (hûn **hevdu** nas dikin), ku nasîna wan ji bo lêhûrnêrîna lêker (fiil) û kesandinê (tesrîf) pirr pêwîst e, di feslê VIIîn ê Morfolojî (awayên gotinan) de li wan hatiye hûr nêrîn; lê li pronavên din paşê hatiye nêrîn. Di eynî amancî de, bendên giringtirîn bi tîpên reş hatine hejmar kirin. Lîsteyine gotinan û hînkêr di dawîya her feslî de, di destpêkê de, hati bûn danîn, lê ji bo sivikirina vî cildî, ew hatin rakirin.

Bê gûman, ne bê destkewtî (faide) ye ku em baş bînin bîra xwe ku, di cihêyîya gelek lêhûrnêrînan li ser gelên Rojhilatê de (orientalisme: rojhilatzanî) ku di dema buhurî de û îro jî li ser kurdî hatine weşandin, ev eser weka rêzimanê zimanekî ya tebîî, û tu (qet) ne weka ankêteke zaravî ye. Ev pirtûk birastî dixwaze ku di şopa dîtina pêşeng ku ji Mîr Bedir Xan re rehberî kir, bikaranîna qenc a Kurmancî bîne ber çavan û tesbît

bike, ji derveyî her veqetandineke navçeyî û her nûyîtiyeke "zanyarî". Ji nîşandana xusûsiyetên navçeyî bêtir, me xwest ku em yekbûneke bingehîn derxînin. Bi dîtina me, lêgerîna zaravî bitenê bi zanîna kûr a van damezranên giştî ku di kurdî de hîn diviyarî bûn tesbît kirin kare netîceyên birastî dewlemend bide.

Bi vî awayî, metoda me ew bû ku em rastiyên zimanî weka ku di peyvîkên cihê de ku bi wan re pêwendiyên me hebûn (ango bi hêzanî, yê Kurdîstana Tirkîyê; kêmtir, yê Iraqê, û pirr kêr, yê Iranê) xuya dibûn, binivîsîn û bikaranînan fîrehtirîn derxînin, ji bo ku em, di dawiyê de, ji wan rêzikên giştî derxînin û di eynî zemanî de, çiqas mînkîn be, xusûsiyet an istisnayên zaniyariyên giringtirîn nîşan bidin. Gotinên "rast" û "ne rast" ewê carna di danasiya me de bi kar bînin. Ev gotin ewê belkî ne pêwîst xuya bibin, ji bo ku ew li ser zimanekî ku, weka kurdî, ewqas kêr hatiye nivîsîn, tetbîq dibin. Li gel vê qasê, ew (gotinên "rast", "ne rast") tu bijartineke şexsî nîşan nadin, û, di hemî rewşên ku li wan hatiye nêrîn, ew li gora raman û mentîqa zimên diçin. Çend caran, me, di ankêtên xwe de, gundî yan koçerên nezan ku li ber hevokên (cumle) çewt ku me bi mebestî (bi qesdî, mexsûs) ji wan re pêşkeş dikir vedicîniqîn, û yan jî ên ku, di civînên şevê yê dirêj de, bi heyecan li ser pirsên zimên ku me dixist bin destê akadêmiya wan munaqeshe dikir, dîtî? O pêwîst e em bala xwe bidin zûbûna tesbît kirina tebîî ya bikaranîna navîn a Kurmancîya nivîsî, di kovara Hawarê de, li gel ku eslê nivîskarên wê ji navçeyên cihêtirîn bû.

Xwendevan ewê bibîne ku di vê pirtûkê de tu lêgerînan ku, çiqas birûmet bin jî, li ser zimanê kurdî, ji aliyê biyanîyan an xwendayên erd bixwe, hatine weşandin, tu nene. Sedema vê yekê ev e ku, hema di her gavî de, pêwîst bû meriv tecrube bike ku kopyên bigûman (bişik), nivîsînên dangan (grafî) ên ne rast û tefsîrên çewt rast bike û, bi vî awayî, vî cildî bi aleteke rexne (krîtîk) ya giran û bê kar (bê faide) bar bike.

Ez bawer dikim ku nîşeke tenê bes e ji bo ku tu tiştê bîr cihên xwe: Oskar Mann, zana û zaravnasê biwîcdan û çavêkirî, di pirtûka xwe "Die Mundart der Mukri-Kurden" (ango: Zaravê Kurdên Mukrî) (Berlîn, 1906-9) de, ewha dinivîse: "Es ist leider nicht zu entscheiden, weshalb im Mukri dieser Casus Obliquus promiscue teils auf -ê, teils auf -î, auslautet oder vielmehr unter welchen Bedingungen der eine oder der andere Vocal aufzutreten hat" (ango: Meriv, mixabin, nikare zanibe di kîjan mercan "şertan" de, li ba

Mukriyan, ev têrker "tumlec, mefûl", bi -ê, yan bi -î, diqedin). Ew li wira, di munasebetê de, dixwaze bitenê cihêbûna nişanên têrkerên mê û nêr (nişe: ez jinekê dibînim. Ez zilamekî dibînim), ango yek ji xusûsiyetên ku cih didin veqetandina her du zayendan (cinsan) û ku Mîr Bedir Xan ê yekemîn bû ku ew, bi awakî vekirî, ronî kir.

Weşanên nuhtir û li gel hertiştî, pîr hêja, ji çewtiyan ne dûrtir in û ez karim vê yekê vegebinim kurtnivîsa xwe li ser hin eserên sovyêtî, di N° 51 (sêmeha 3în 1960) a kovara l'Asie et l'Afrique de.

Ji bo sedemên ku nuha hatin nişandan, nişeyên ku di vê rêzimanê de ne ji aliyê nivîskaran, li gora rêzikên ku divên bèn nişan dan, hatin tesewur kirin, yan jî ji kovarên Hawar (H.) û Ronahî (R.) yan jî ji pirtûka piçûk a xwendinê "Xwendina Kurdî", Şam, 1938 (X.K.), hatine stendin û çewtiyên çapê ku, mixabin, tê de bi jimareke mezin tîn dîtin, gava ku pêwîst

bû, dihatin rast kirin.

Amman, nîsan 1968

R. LESCOT

Meriv li vira bîblyografiyeke eserên giringtirîn li ser zimanê kurdî bide, bitenê bi mercê ragihandina wê bi balkişandinên rexnî (krîtîk) destkewt (bi feyde) dibe. Lê, ev nikare têkeve çarçeva vê pêşgotina kurt. Bi vî awayî, emê bitenê we vegebinin bîblyografiya ku di Kurdish dialect studies a D.N. Mac Kenzie (2 cild, Oxford), 1961) de xuya dike, û bi seriyên (başlık) jêrîn temam bikin:

Musa Anter, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Istanbul, 1967. Kamuran Bedir-Xan, Zmanê mader, la langue maternelle, alphabet et lectures kurdes, Paris, 1965. N. Bedir Xan, Nvîsa min, mon livre, cours pratique de la langue kurde, Paris, 1965. K.K. Kurdoev, Ferhenga Kurdî-rûsî, Mosko, 1960. Taufiq Wahbî û C.J. Edmonds, A Kurdish-English dictionary, Oxford, 1966.

---

## SÎMÎNAREK SER SÎNEMA KURDÎ

Redwanê ALI

Roja 18.12.1984-a, simînareke hêja li ser dîroka peydabûna filmên kurdî u filmên li ser Kurda li bajarê Mosko hat saz kirin. Simînar hat amadekirin ji aliyê xwendekarê institûta kînomatografê,

heval Birhan Şawilî. Ji ber giringiya vê simînarê me dît tiştêkî pir qence ku di vê gotarêde bi kurtî ser naverûka wê ji xwendevananre lêkin.

### Kengî film ser Kurda hatine kişandin?

Cara yekê ku film ser Kurda çêbune sala 1915-a bû. Di vê salê de, xortên Ermenya filmek derxistin di bin navê "Jiyana di bindestiya Kurdade". Lê gelekî mixabin, ew film tiştêkî hêja jê nema ji xeynî perçakî pir hindik. Di gel ku mebesta çêkirina vî filmî propagandek dijî Kurdabû, lê hebûna wî îro qîmetek mêjwê (dîrokî) pir mezinbû. Dibe ku ikzimpilyarekî (nisxeke) din jê mabe li hin arşîvên dewletna, lêger u lêkolana ser vî filmî dimîne weke karekî duwaroj ji kînomatografîst, kînorejisior u lêgerê çanda kurdîre. Ji ber ku ew film niha tineye, u perçên esasî jê windabûne, mere nikare tiştêkî derheqa wîde lêke yan jî, wî

bijmêre weke filmekî kurdî, ku, ji wî dest pê dibe diroka sînema (kino) kurdî.

Cara yekê ku filmên kurdî peydabûne, vedgere ser sala 1926-a. Di wê salê de, kînorejisior Bêk Nezarov filmê "Zerê" derxist. Naverûka film çîrokek evîniye di navbera herdû lehengên esasî, Zerê u Seîd deye. Têde bi taybetî kifş dibe zehmeti u çetinahiyên ku li pêşiya Şorişa Sosiyalizm peydabun li navçên kurdî ji Ermenya Sovyêtî. U xweş jî tê xuyanêkirin rola urf u edetên kevnar u xerab di paşmaîna civaka kurdîde. Filmê "Zerê" du nisxe jê hene, yek li Erivaneye u yek li Moskoye. Piştî filmê "Zerê" bi şeş sala, kînorejisior Matrosiyan sala 1932-a filmek çêkir

bi navê "Em Kurdên Yêzîdfîne!". Film hatiye kişandin li gundekî ji gundê Kurdên Sovyêt. Mistewa vî filmî bi gelekî ji yê "Zerê" nizmîrbû. Ji vî filmî nixak maye ew jî li Erîvanêye. Piştî filmê Matrosiyani demeke dirêj tiştêkî nû derneket, tenê sala 1959, di filmê "Em internasionalistin", çend kadro li ser Kurdên Sovyêt hatin kişandin. Sala 1972a filmekî teze li ser Kurda derket. Navê film "Em

Kurdin". Di vî filmî de li ser rewşa Kurdên Sovyêt tê axaftin u kifş dike guhartinên, pêşveçûnên mezin di jiyana wande.

Gereke em li vir bêjin jî wekî gelek filmên dekumental jî li Yekitiya Sovyêt li ser Kurdên dereke hene, nexasim li buwêrên salên 40-î, ser Komara Mahabad u salê pey warre.

## Filmên Ewropîyan ser Kurda

Di hin dokumentên dirokîde, dibe behsa filmên dekumental yê ku li ser Kurda hatine kişandin. Wa ji tê gotin wekî nêzîkî 30 filmê renga-reng li welatên Ewropa Rojava hene. Diyare filmên hatine kişandin di salên 30-40 de, nexasim yê ku rêkxirawên ermenî girtine, ne tenê nehatine bela kirin lê her wisa jî durî arşîvên dewletên Ewropî jî hatine parastin. Ew bi piraniya xwe milkê rêkxirawên Ermenîbûn.

Di salên 40-50 de, gelek ajênsên televîzîona, gelek rojnamevanên Ewropî reportajên xwe li Kurdistan girtine. Ev yeka jî ta niha nehatiye lê kolan u ew jî dimîne erkê duwaroj yê lêgervan u sinetkarên sînema (kîno) u çanda kurdî.

Weke em zanin, filmên ser Kurda jî, weke her literatûra din ser Kurda, şerê wan tê kirin ji aliyê karbidestên ku

welatê me di navbera xwede parvekirine. Ji ber vê yekê u gelek sedemên din prospektîva filmên ser Kurda kême, fêde u sûda çêkerê wan ne ewqas ber bi çave. Di salên 70-î de hukumeta Elmaniya Federal emir da çend filmên biçûk ser Kurda li pey hev derxe, paşê hat kifşê ku hukumeta Iraqî di rêya agêntên xwede, xwe giyand hineka ji xwendiyê wan filman u ew bertil kirin yan filmên wan kirin bi nêrxekî pir biha bona ew filmana neyên bela kirin. Hukumeta Iraqî serê her deqîqê 30,000 mark peredan. Rojnamevanekê tenê qîma xwe nanî bi pera. Ewê filmê xwe ser tevgera kurdî derxist u di gelek derade elan kir wekî wê "Filmê xwe nefiroto bi 500,000 dînarî!".

Di van salên dawî de navê gelek filman ser Kurda tê ser zimên. Yê herî qenc di nav wande yê ku Instîtûta Kurdî li Parîs derxistiye "Dengê Kurdistan".

## Hunermend u rejîsîyorên kurd

Gelo çi rola hundermend u rejîsîyorên Kurda bi xwe di vî warîde heye? Kurd li Iraq, Iran, Tirkiya u Suriya bi sinemê mijûl bûne yan na? Wan çi film çêkirine u çi rola filmên wan di warê propaganda fikra Tevgera Azadîxwazî Kurdîde heye??

### **I R A Q**

Di Iraqê de gelek hundermend u rejîsîyorên Kurda (Yên bi jêza xwe Kurdên) bi karên pir giranbiha rabûne. Sala 1955 Kamêran Hussnî ji Emerîka vegeheriya piştî xelaskirina Instîtûta kinomatografî. Hema di wê salêde jî ewî "Kovara Sinamê" li darxist. Kamêran H. ta niha gelek filmên Erebbî çêkiriye, lê mixabin tu filmên wî li ser Kurda tunene. Di salên 60-î de Xelîl Şewqî filmê "Haris" derxist. Yehya Faiq tê jimartin weke himdarê sînema Erebbî li Iraq (ew ji Kurde bi jêza xwe).. Heger em tenê navê wan rejîsîyora u navê filmên wan bijmêrin wexteke dirêj ji mere divê. Lê gelo çima van kesana filmên Kurdî çênekirine?

Heger em li dîroka sînema Iraqî binêrin emê li navên va jî rast bîn weke: Muhemed Şukrî Cemîl (ji Sulêmaniye); Hikmet Lebîb (Hewlêr); Celal Pitoşî; Selman Faiq.. Ango yê ne durên ji axa Kurdistan, lê van hemuwa filmên xwe bi erebbî çêkirine u xizmet negiyandine sinemake welatê xwe, sînema Kurdistanî!

Heger em bala xwe bidin çi tevgerê azadîxwaz mere dibîne rola filma di danaskirina mafê wê tevgerê, xebat u têkoşîna wê gelekî mezine. Lê yê me Kurda, çima ta niha kes nefikiriye ku wê hêza bê sînora, wê hêza nûjen bikarbînin??

Heger em wê meselê deynin alîkî u em li aliyê dinî meselê binêrin, divê ku em bêjin: Li Kurdistanê Iraq hinek hewldanên biçûk bel bûne di warê çêkirina filmên kurdî de. Ji van hewldana: demeke dirêj Yehya Faiq kar kir bona kişandina filmê "Mem u Zîn" lê dîsa mixabin karê wî biserneket ji ber bê têkiliye. Yûsif Girgîs hewlda ku filmekî bikşîne di bin navê "Kawaye Hesinker" de, ewî 20 deqîqe

jî kişand, lê karê wî rawestiya ji ber Inqîlaba kevneperest sala 1963-a. Ji xeynî van hewldana filmên ku ser Kurdê Iraq çêbûne evin: "Kurdistan"-filmê Endraws (Fileya ji Kurdistana Iraqê). Ev film jî hukumeta kevneperest nahêle bê temaşe kirin ji ber ku "Mistewa wî niz-me!". Filmê din yê me bihistiye filmê Kadir Nurî (li ser şerê Kurda van salên dawî). Ev herdu film jî dekumentaline.

## Î R A N

Di salên 60-î de, tevgera karê sinemai dikeve bajarên Kurdistana Îran jî. Di van salande Studiowa çêkirina filma li Kirmanşah vedibe. Kadirên kurd yên mijûl bûn bi sinetê sînemê dest bi çêkirina filmên farisî kirin, em bêjin Isaîl Koşan, Farûq Caferî u yên din..

Filmê ku cara yekê têde behsa Kurda dibe filmê Nasir Takfaî bû "Sadiq Kurd". Naverûka vî filmî li ser zilamekî kurde bi navê Sadiq. Têde tê kifşê wekî tumbêlek li jina wî dide u jinik dimre. Sadiq vê buwêrê nikare ji bir bike, ji ser hişê xwe dire, dibe "qatîe teriq". Ji rejisiorên kurda yên filmên li ser Kurda çêkirine mere kare navê Yasmak Yasimî bêje. Ewî du filmên li Kurdistan kişandine u bi Zarava Lorî. Yek ji wan navê wî "Çavnerî-

nyek li ser tihêla avê". Film hatiye kişandin li hindava dezehka Urmiya. Ji xeynî van filman, filmên din jî çêbûne ser Kurdan lê piranya wan didin xuyakirin wekî Kurd jî Farisin weke filmê "Faris Kurd" u yên mayin..

Gelekî mixabin ku niha li dewletên Ewropa Rojava hunermendên hêja u zana weke Mehruçî u Seîd Salas u y.u. dijîn u durî tevgera miletê xwene. Ez dibêjim dim hatiye ku miletê me jî li xwe bipirse gelo zarwên wî, sinetkarên di warê sinemê de, çi karin bikin bona pêşveçûn u serkeltina tevgerê?

## TURKIYA

Heval Birhan Şawilî bi firehî li ser rola rejisior, niviskar u kinomatografê Kurda yî mezin YELMAZ GUNÊ axaft. Di pêşiya gotina xwede jî, li ser karê sine-meçiyên kurd li Turkiye, ewî eşkere kir, wekî "di vî beşî de wê tenê li ser jiyana efrandinên YelmaZ bixavê".

Dawiya simînarê giftûgwek zor intirês u hêja çêbû.

Têbînî: Ji ber ku li ser YELMAZ GUNÊ di prêssa kurdîde bi firehî hatiye lêkirin, me li vir pêwîstî nedît ku vî beşî binivisin.



# 1915 - 1916 : ERMENİ KATLIAMI

PERVIN

Altmış sene önce, tarih 24.04.1915; Türk hükümeti, Ermeni entellektüellerini İstanbul'da hapishanelere attı. Bundan sonra bir buçuk milyona yakın Ermeni katliam ve toplu sürgün edildi.

Her sene, bu tarihte, Sovyetler Birliği Ermenistan Cumhuriyeti başkenti Erivan'de yüzbinlerce insan, 1965 yılında şehre yakın bir tepenin başında dikilen katliamı anma anıtını ziyaret ederek gül takımları koymaktadırlar. Fransa'da, Orta Doğu'da, Amerika Birleşik Devletlerinde ve Avustralya'da da bu günde, dini merasimler, konuşmalar ve yürüyüşler düzenlenmektedir.

1878'de, Berlin antlaşmasında, Osmanlı İmparatorluğu temsilcileri, Ermenilerin bulunduğu şehirlerde bazı 'reformlar' yapmayı planlıyorlardı. Fakat, o temsilciler daha sonra, anlaşmanın o noktasını bir ke nara kaldırıp Ermenileri yavaş yavaş yerlerinden kaldırmaya başladılar. Amaç, Ermenileri doğu vilayetlerinde mümkün olduğu kadar azaltmak idi.


Sürgünlerden sonra, hükümet sorumluları ilk olarak, 1895-1896 yıllarında, Ermeni halkına soykırım uygulamaya çalıştı. O sene içinde, 300 000'e yakın Ermeni öldürüldü. Soykırım Avrupa devletlerinin baskısı sonucu durduruldu.

Ama, 1915'te Birinci Dünya Savaşı nedeniyle, Avrupa, büyük Ermeni katliamına herhangi bir tepki gösteremedi. Osmanlı İmparatorluğunun yönetimini 1908'de ele geçiren, Almanya safında savaşa katılan Jön Türkler, Ermenileri yeniden temizleme kararını aldılar. Onlar, Ermeni gençlerini askere çağırdılar, fakat tüm Ermeni gençlerini kışlaların önünde öldürdüler. Diğer taraftan da Rusya sınırlarında, Ermenilerin varlığının tehlike olduğunu bahane ederek tüm Ermenilerin Suriye'ye doğru sürgün edilip o bölgelerde yerleştirmeye karar verdiler. Bu sürgünler, vahşetin ta kendisi idi. Suriye'de kamplarına yetişen Ermeniler, nefes aldirmeden tekrar başka yerlere sürgün ediliyorlardı.

Türk hükümeti şimdiye kadar, bu toplu katliamı inkar ediyor. Fakat, 15.4.1984'de Halklar Mahkemesi (Tribunal permanent des peuples) Sorbone'da yaptığı toplantıda derin bir incelemeden sonra şu açıklamalarda bulundu:

"Ermeni halkına karşı uygulanan, vasıflandırılması güç olan toplu katliamlar ve sürgünler 9.12.1948 antlaşmasına göre mahkûm edilen soykırımdır."

Ermenilerin çoğunun Kürtlerle yaşamasından dolayı, 1895-1896 katliamında, Kızıl Sultan Abdülhamit, "Hamidiye alayı" diye adlandırdığı bir Kürt silahlı gurubunu da kullandı. 1915-1916 katliamında da bazı Kürt aşiret reislerini ve bazı fanatik Kürtler yer aldılar. Fakat, Kürt halkı, ya da Kürtlerin çoğunluğu, ya da tüm Kürtler Ermenileri öldürdüler diye bir iddiayı öne sürmek büyük bir hatadır. Bunu söylemekteki amacımız, günahlarımızı temiz çıkarmak değil, ama, her iki halkın, yani yüzyıllardır beraber yaşayan Kürtler ve Ermeniler, bu toplu katliamın sorumluluğunu Türkiye hükümetinin üzerinden atmamaları ve ezilen bu iki halkın arasında kınin oluşmasını engellemek içindir. Bu katliamdan sorumlu tek canı, Kürt halkı değil, Türkiye hükümetidir.



Le génocide des Arméniens, Gérard Chaliand, Yves Ternon, 1984.

# DÎROKA KU RDI STANÊ DÎ

- I -

## A. Kok û dîroka pêşîslamî

Rêzkirina Kurdan di nav netewên îranî de, bi hêzanî li ser zanînen zimanî û dîrokî ava bûye. Ev rêzkirin dîtina xwe li ser tevliheviya êlêmanên (unsur) etnîkî yê Kurdan, bê nasîna wan, nabêje. Guharbûna tîpê Kurdan li gora cihan xuya dibe. Dibe ku êlêmanên kurdî ji Rojhilatê (Farisistana rojavayî) hati bûn Rojavayê (Kurdistana navîn), lê dibe ku berê hatina Kurdan ber bi Kurdistana navîn, neteweke ku kokeke wê cihê lê ku navê wê nêzîkî yê Kurdan bû (Kardû) li Kurdistana Navîn dijiya bû û paşê tevî Kurdên îranî bû.

Li ser her du kevirên şîpane (berderî) yê Sûmirî, ku dîroka wan nêzîkî 2000 sal berê mîladê ye, Thureau-Dangin (kovara Assyriologie, V, 99, VI, 67) navê welatê Kar-da-ka dît: li gora gotina şexsî ya wergeran, tîpê yekemîn K ye, ne Q ye, û fonksiyona êlêmanê K bigûman (bişubhe) ye. Welat li kêleka "xelkê Su" (ZA, XXXV, 230, N° 3) ku Driver li Başûrê gola Wanê dibîne ye: Keleke kevn, Sûy, li navçeya Bidlîsê heye (Şerefname, I, 46). Piştî hezar salan, Tiglath Pileser dijî gelê Kur-tî-e, li çiyayên Azu ku tê de Driver (eynî eser, rûpel 400) Hazo (Sasun) a nuh dibîne, şerr kir. Lê ev fêra Kur-tî-e ne emîn e.

Di sedsala Vîn de, Hêrodot navekî weha nîşan nade, lê, li gora wî (III, 93), di navê 13în ê imperatoriya Akemenî de, li kêleka Ermenîyan, navê Paktîkê ku Nöldeke (Gramm. d. neusyrischen Spr., Leipzig 1868, p. XVIII) û Kiepert (Alte Geogr., § 81) nêzîkî navê Boxtan = Bohtan dike, hebû.

Paşdevegerana Deh Hezaran ku ji aliyê Kzênofon (401-400 berê mîladê) hatiye wesf kirin, Kardûk ku welatê wan li Rojhilata Kentritês (Bohtan) dirêj dibû, binav û deng kirin. Ji wê çaxê, meriv navê vê kokê hêrgav li erdê ku li kêleka çepê ya Diclê, nêzîkî çiyayê CODÎ, dibîne. Li ba nivîskarên klasîk, ev navçe bû Korduên (awayên vî navî pirr in; belkî ji sedema zorbûna bilêvkirina q yê samî ye. Li Driver, eynî eser, binêre). Li ba Suryaniyan, navê vê navçê Beth-Kardû bû, û navê bajarê îro yê Cezîrat Ibn Umar,

Gazarta d'Kardû bû. Ermenî navê Kordux, Ereba ê Bakarda "Kardai" (al-Baladhurî 176; al-Tabarî, III, 610), bi kar anî. Li gora Yaqût (IV, 56), ku xwe dispêre şehadeta Ibn al-Athîr, nahîya Bakarda girêdayî Cezîrat Ibn Umar bû, 200 gundên wê hebûn (al-Thamanîn, Cûdî, Fîrûz-Şabûr) û li ser kêleka çepê ya Diclê, li hemberî Bazabda, li ser kêleka rastê, ava bû bû (li lêhûrnêrîna mukemmel a nivîsaran, di M. Hartmann, Bohtan, 33-5 de, binêre). Piştî wê, navê ku bitenê li vî gundê dîrokî dihat danîn ji têrminolojiya (tevayîya gotinên teknîkî) misilman hunda bû û dêlva wî navên Cezîrat Ibn Umar, Buhtan.... tên danîn. Li ba Ermenî û Ereban, firehbûna erdê Kardû bixwe pirr piçûk e. Em sînorên rast ên navçeya Korduên nizanin: sê bajarên wê: Sareisa, Satalka û Pinaka (=Finîk) li ser Diclê ava bû bûn. Lê şehadeta Strabon, IX, 12, 4, ku dibêje ku navê Gordyaia orê (ango çiyayê Gordyaia) carna digihajt çiyayê navbera Diyarbekir û Mûşê yê îro, pirr hêja ye.

Lê, kî ne ev Kardûxoi ku jîna navê wan bêgûman di nav navên paşin de ajot? (nîşana xoi/belkî nîşana gelemjarmê "pirrbûnê" ya ermenî, x, be. Û dibe ku Yûnan vî navî ji devekî ermenî hîn bû bûn)? Li gora Kzênofon (IV, 3.1), Karduk ne serdestiya qral Artaksêrksês û ne ya Ermenîstanê dipejirand (qebûl dikir). Gava ku, di sedsala Iîm berê mîladê de, Korduên ji aliyê Tigran II hat vegirtin (işgal kirin), Tigran qralê wê, Zarbiênus, da kuştin. Di 115 piştî mîladê de, navê qralê Korduên Manîsarûs bû. Li gora Hübschmann, Die altarm. Ortsnamen, 239 û Armen. Gramm., 1/2, 1897, 518-20, navçeya Korduên bitenê bi awakî sivik hat ermenî kirin.

Di eslê xwe de, divê ku meriv şaş nebe ku di dema nêzîkî Kzênofon de êleke (eşîr) îraniyeke veqetayî li Bakurê Diclê bibîne; lê ji bo ku meriv rengdêra (sifet) etnîkî ya Kardûkan zanibe, bitenê şehadeta navê wan heye. Ev nav, nêzîkayî-yên wî (analojî) yê samî hene (bi akadî-aşûrî qardu "xurt, qehreman" e, Karadu "xurt bûn" e); ji alîkî din jî, bilêvkirina tîpên bédeng ên vî navî nêzîkî ya

(\*) Encyclopédie de l'Islam, rûpel 450-52, Parîs 1981. Wergerandin: Fransîzî-kurdî: Pervîn.

# ANSÛKLOPÊDIYA ÎSLAMÊ DE

(\*)

'navê gelê Xaldî ku bêtir di bin navê aşûrî, Urartu/Uraştu, bi yehûdî Ararat, li ba Yunaniyan Alarodîoi, Xaldoi û carna Xaldaîoi, hatiye nasîn, heye. Ev gel, li Ermenistanê, nêzîkî sedsala IXîn berê mîladê, hat dîtin û paşê li navçeya gola Wanê qraliyeke xurt ku heta destpêka sedsala VIîn ajot ava kir. C.F. Lehmann-Haupt (Mater.z.älter. Gesch. Armeniens, Göttingen 1907, 123) Xaldiyan weka penaberên (muhacir) Rojavayê dibîne; E. Meyer (Gesch.d. Altertums, I/2, Stuttgart 1913, § 474) li rawesta (nuçte) hatina wan, li ser çemê Arasê navîn, digere. Piştî hatina Ermeniyan (nêzîkî sedsala VIIîn), Xaldî hatin belav kirin û ber bi çiyê veqerandin (Cypopédie, III, chap. I-3), lê navê navçeya Bakurê gola Wanê bêtir jiya (Xaldia, nêzîkî Trabzun, bajarê Xilat = Axlat...; li Belck û Lehmann, di ZA, IX (1894), 84; De Goeje, eynî eser, X, 100; Streck, eynî eser, XIV, 112) binêre. Hinan tecrube kir ku paralêlên "ên ku di eynî zemanî de bi kar tên" navê Xaldî dirêj bikin aliyê Qefqasyê: Gurciz navê wan Xarthu-eli/Xart-ul-i, bi swanî Xyard, bi mingrêlî Xort-u). Li Adontz, Armenia v epokhu Iustini-ana, St. Petersburg 1908, 398, binêre. Meriv Karduan girêde Samiyan an gelên ku berê wan hati bûn jî, rastî ew e ku erdê Kardûkan ê kevn îro yek ji cihên yekemîn ên netewê kurd e. Bi vî awayî, netîce hat stendin ku şexsiyeta Kardûkan a Kurdan e. Û ev dîtin hîn di destpêka sedsala XXîn de jî weka rastiyeke dihat hesabandin (li Gr. I. Ph., II, 464 binêre). Hin dûrtir jî diçûn û carna Kurdan rast bi rast ji Xaldoi nêzîkî dikir. Ji zû de, Reiske di dîtina xwe li ser Konstantin Porfirojênêt, De Ceremoiis, B. 13 (713) de dinivîsî: "Chaldi et Kordi vel Curti, Gordyaei iidem" (ango: Xaldî, Kordî yan Kurtî, Gordyaei hemî yek in). Dîtinek nêzîkî vê jî di seriya esera Lerch xuya dibe: "Recherches sur les Kurdes iraniens et sur leurs ancêtres les Chaldéens septentrionaux", St. Petersburg 1856 (ango: Lêgerîn li ser Kurdên îranî û li ser bavûkalên wan, Kildaniyên bakurî).

Awakî nuh ji vê pirsê re ji aliyê lêgerînên M. Hartmann, Nöldeke û Weissbach ku pêwistiya cihêkirina babetên (konu) Kurd û Kardû, ji aliyê zimên nîşan da, hat dayîn. Di eynî zemanî de, eynî zanan pêşneyar kir ku Kurdan di Kurtoioi Sirtî ku nivîskarên klasîk li Mîdyâ û Farisistanê nîşan didin (Strabon, XI, 13 û XV, 3), nas bikin. Ev nezeriye bi hebûna gelek êlên kurdî li Farisistanê hatiye

te'kîd kirin. Hebûna van êlan ji dema Sasanî de hatiye te'kîd kirin (li Karnamak-î Artaxşîr-î Papahan, wergerandina Nöldeke, Göttingen 1879, 37, 48, û şehadetên nivîskarên ereb binêre).

Cihêkirina meşrû' ya navên Kurd û Kardû carna pirsê zanîna serfiraziya Sirtiyan (=Kurdên îranî) di mêtina erdên Rojavayê Zagrosê, cihê Kardüyên kevn û çiyayê Anti-Torosê heta Bakurê Sûriyê, bê bersiv dihêle. Ev pirs hîn lêgerînine hûr pêwîst dike. Di destpêkê de, vegirtinên (işgal) Med û Farisan bûn sedema cihguhartinine mezin ên hin gelên îranî. Nîşeke ji tevgerên birekî ji Asagartiyan ku cihê wan li Sistanê bû hatiye dayîn: di dema Aşûrî de, meriv van Sagartiyan li Mîdyâ didît (li Zikirtu yan Zakurtî; li Streck, ZA, XIV, 146 binêre), û di dema Darius (Dara) de (nivîs. Bihistûn, 2, 90) Paytexta wan di deşta aşûrî de, li Arbêl ku li wira Dara serokê wan, Sitrantaxma ku wêna wî li ser zinarê Bîsutûn ruyekî kurdî (?) nîşan dide, bû (L. W. King, The sculptures... of Behistan, London 1907). Di navbera 220 û 171 berê mîladê, çekdarên "bipere" ên Sirtî li Asya Piçûk, di şerrên ku di navbera Roma, Selcûkiyan û qralên Pergam dibûn, cih digirt (Tite Live, XLII, 58, XXXVII, 40; Polybe, V, 52; li Weissbach, di Pauly-Wissowa de, s.v. Cyrtii, û A.J. Reinach, les merceinaires de Pergam, di Revue Archéologique, 1909 115-9 de, binêre). Rewşeke derbasbûnê ya pîrr ecêb ji Cografya Ermenî ya sedsala VIIîn, li ser wilayeta Korêêv, xuya dibe (li gora Adontz, Armenia, 418: Korêêv ji Kortîêaix hatiye û rêzayê(mana) Kortîêaix Korotiê "Kurd" e, weka ku rêzaya Atrpatiê "rûniştvanê Atrapatên" e). Di dema Faustus Byzantînus (sedsala IVîn) de, Korêêx bitenê nahiyeke nêzîkî Salmas bû (q.v.). Weka NAVÇE, Korêêx, ji wê gavê de, di navbera Cûlamerg û Cezirat Ibn Umar de dirêj dibû û ev nahiye tê de bûn: Kordux, her sê Kordix (Kordix), Aituwanx, Aigarx, Motolanx (Otholanx), Orsiranx (Orisanx), Karathunîx (Saraponîx), Cahuk û Albakê Piçûk (Hartmann, Bohtan, 93; Hüschmann, Die altram. Orstsnamen, 255-9).

Di wê gavê de, meriv guhartinên ku çêbûn dibîne: ji nav sê qezan: Kordux, Kordix û Tmorix ku Faustus, dêlva Kordû-ên'a kevn, nîşan dide, Kordux bû bû nahiyeke piçûk a Korcêx, û Tmorix hunda bû bû û dêlva wê Kordrix (Kordix) ku meriv bitenê nahiyên wê yên bilind, navîn û nizm didîtin, cihê wê stendi bû.

Hübschmann (eynî eser, rûpel 385)

'bitenê Kordrix'an/Kordix'an' ji Kartoioi'-yan vediqetîne; lê, bi awakî giştî, veqetandina zimanî ku ji aliyê M. Hartmann û Nöldeke hatiye danîn, hebûna awayên tevliheviyên zimanî inkar nake (M. Hartmann, eynî eser, 92: "es gingen wohl schon früh die Namen durcheinander" "ango: pirr zû, nav tevlihev bûn"; Nöldeke komeke siyemîn a navan jî dît: bi suryanî **Kartêwayê/** bi erebî **Kartawiya** (?), ku navên Kurdên rast in; li Hoffman, Auszüge 207, n. 1639 binêre).

Bi vî awayî, nêzikî çaxa vegirtina erebî, bitenê navekî etnikî, Kurd (gelejmar: **AKRAD**) dest bi nîşandana êlên îranî û ên îrankirî yê tevlihev kir. Ji nav van êlan, ên rûniştevanên eslî hebûn: Kardû; Tmorix/Tamurayê di qeza ku navenda wê Alkî = Elk bû; Xothaitai = al-Xuwaythiya di nahiya Xoit a Sasun de; Ortayê = al-Artan di xwarbûna Feratê de; Samî (li jênealojiyên "eslê maliyekê" yê êlên kurdî binêre) û belkî Ermenî (tê iddia kirin ku êla Mamakan koka wê Mamikonî ye).

Di sed sala XXîn de, di nav Kurdan de unsurekî îranî yê ne Kurd (koma Gûran-Zaza), bi awakî vekirî hat derxistin; di çend gundan de, li ba Kurdan, hebûna çînen civakî ku bi serdestiya rêzanî (siyasî) ya ên ku nuh hati bûn ava bûye hat dîtin (li Sileymaniyê "q.v.", li Sawc-Bulak q.v.", li Kotûr ku têde bermayiyên Kuresinliyan bîndestên Şakakiyan in). Lêgerînên muntezem ewê karibin şopên gelên kevn ku bi çîna kurdî ku wan yek kirine derxînin.

#### **JÊNEALOJÎ Û ETÎMOLOJİYÊN GELERÎ**

(Jênealoji: eslê maliyekê, ji bavûkalan heta zarokan. Etîmolojî: zanîna lêgerîna eslê gotinên zimanekî, li gora awayên wan ên kevntirîn û pîvana wan bi zimanên din re ku ji eynî komî ne).

Kaniyên misilman û adetên kurdî yê kevn dîtina çara pîrsa kokên Kordan tu hêsan nakin. Ji berê, al-Mas'ûdî (Murîc, III, 251 = § 1114) digot ku ew ji van Farisên ku ji **DAHAK'**ê diktator reviya bû bûn hatine. Ev efsane bi hêzanî ji Şahnamê (Marcan, I, 27-8; Mohl, I, 71; Vul-lers, I, 36, beyt 29-38) hatiye nasîn. Hîn di 1812 de, Morier (Second Journey, 357) li Damawandê pîrozkirina cêjneke ku rizgarbûna Farisistanê ji xwînmejiya **DAHAK'** (31ê gulane) û ku navê wê "Ayd-i-Kurdî" "ango: cêjna kurdî" ye darîçav dike. Ji alîkî din jî, Kurd ji xwe re li jênealojiyên (eslên: rayên) erebî digeriyên. Hinan (Murîc, III, 253 = § 1118) ji xwe re weka kal Rabi'a bin Nizar bin Ma'add, hin jî Mudar bin Nizar, didît. Her du jî navên ku navên navçeyên xwe

stendine ne: Diyar-Rabi'a (Mawşil: Mûsil) û Diyar-Mudar (Raqqa). Dibêjin ku Kurd ji koka erebî, ji sedema dubendiyên bi Xassaniyan re, veqetiyane û xwe kişandine çiyân, pêwendiyên xwe bi biyaniyan re kirine û zimanê xwe yê dayikî ji bir kirine. Ji vava balkêştir jî ew e ku di rêzeke kalan de ev nav hene: Kurd bin Mard (li cîranên Sirtî, Hoi Mardoî, binêre), bin Sa'sa'a bin Harb bin Hawazin (al-Mas'ûdî, eynî eser, û Tanbîh, 88-91: Kurd bin Isfandyadh bin Manûşahr; Ibn Hawkal, çapa 2în, 271, wergerandina Kramers-Wiet, 267: Kurd bin Mard bin Amr). Hemî ev jênealoji, dibe ku di wan de perçeyên pirr piçûk ên bîranînen dîrokî hebin (îranîbûna Samiyan, tevlihevbûna êlên Zagros û Farisistanê).

Etîmolojiyên gelerî ne kêman. Girêdana navê Kurd bi lêkerê (fiil) erebî **KARRADA** hate xwestin (Murûc, III, 249 = § 1113): Kurd zarokên koleyên cuhan û ên şeytan Casad, ku ji aliyê Sileyman hati bûn qewirandin, bûne. Bi pîranî (li Driver, di JRAS, 1923, 403, binêre), navê Kurd bi gotina farisî Gurd (qehreman) hate pîvan, li gel ku, bi rastî, ev navê dawîn tê de G'kî ku bi pehlwî hatiye pejirandin (qebûl kirin) û ku koka wî VAR "parastin" e (Horn, Neupers. Etymol., 200)

Di demeke dereng de, navên êlan pirr caran bi navên navçeyên wan hatin girêdan. Şeref-Name, I, 158, hemî Kurdan (êlên Bacnawî û Boxtî) ji Bacan û Boxt tîne; navê yekemîn kare bi navê Bazn-aw, milê Diçlê, (Andreas, apud Hartmann, 131) bê pîvan. Lê, ê duyemîn, Paktûykê, ê Hêrodot an qralê-cin ê kurd (?) Hafian-Boxt ku Artaxşîr-î Papakan (li Nöldeke, Tabarî, II binêre) kuşt, tîne bîra meriv. Li gora efsaneke din ku bi hêzanî li Bakurê û li Rojavayê belav bûye, Kurd ji berê bi du şaxan veqetiya bûn: Mîlan û Zîlan; ên yekemîn ji Erebiştanê hati bûn û ên duyemîn ji Rojhilatê; Zîlan weka irqekî nizm hati bû dîtin (li P. M. Sykes di Journ. R. Anthropol. Inst., XXXVIII "1908", 470, binêre).

#### **BIBLYOGRAFI**

F. Justi, Kurdische Grammatik, St. Petersburg 1880, rûpel XXII; W. Thomaschek, Sasun und d. Quellengebiet d. Tigris, di S. Ak. Wien., CXXXIII/4 (1895); M. HARTMANN, Bohtan, di Mitt. d. Vorderasiat. Gesell., 1896/2, 1897/1, 90-103 de; Nöldeke, Kardu und Kurden, di le Fest-schrift f. H. Kiepert de, Berlin 1898, 73-81; Hübschmann, Die Alttarmen. Ortsnamen, di Indogerm. Forsch. de, XVI (1904), 255-9; Weissbach, di Pauly-Wissowa de, s.vv. Kardûxoi et Kûrtioi; Driver, The name Kurd and its philological connexions




di JRAS de, 1923, 393-403; M. A. Zakî, Xulasayakî Tarîxî Kurd Wa Kurdistan, Bagdad 1931 (wergerandina erebî A. Awnî, Xulasat tarîx al-Kurd wa Kurdistan, Bagdad 1936, 1961, 40-145); Raşid Yasimî, Kord wa paywastagi-yî nicadî wa tarîxî, Tehran 1940, 15-76; V. Minorsky, Les origines des Kurdes, di Actes XXe Cong. Intern. Orient. de (Bruxelles 1938), Louvain 1940, 143-52; Moh. M. Kordestanî, Kitabî Tarîx Mardûx, Tehran 1950, I, 119-201; Ihsan Nûrî, Tarîhî rîşah nijadî-e Kord, Tehran 2567/1955; B. Nikitine, Les Kurdes, 1956, I-22; O. Vilçevskî, Kurdî. Vvedenie i etniçeskuyu istoriyu kurdsokogo naroda, Mosko-Leningrad 1961; T. Wahby, The origins of the Kurds and their language, di Kurdistan de, KSSE, n° IX-X, 1966.

Bruce Howe, Prehistoric investigations in Iraqi Kurdistan, Orient Inst. of Univ. Chicago Studies, N° 31, Chicago 1960; G. Roux, Ancient Iraq, London 1964; M. E. L. Mallowan, L'aurore de la Mésopotamie et de l'Iran, di Les grandes Civilisations de, Paris-Bruxelles 1966; C. J. Edmonds, Two Ancient Monuments in Southern Kurdistan, di Geor. Journ. de, LXV (1925), 63-9; **eynî nivîskar**, Two more Ancient Monuments in Southern Kurdistan, **eynî eser** LXXII/2 (1928), 162-3; **eynî nivîskar**, A third note of rock monuments in Southern Kurdistan, **eynî eser** LXXVII/4 (1931), 350-5; **eynî nivîskar**, A tomb in Kurdistan, di Iraq de, I/2 (mijdar 1934), 183-92; **eynî nivîskar**, The Place Names of the Aoraman Parchments, di BSOAS de, XIV/3 (1952), 478-82; **eynî nivîskar**, Şar-Bazher and the Basin of the Oalaşwalan, di GJ. de, CXXIII/3 (îlon 1957), 318-28; **eynî nivîskar**, Some Ancient Monuments on the Iraqi-Persian Boundary, di Iraq de, XXVIII (payîza 1966), 159-63.

### PEŞDİROKE U ARKEOLOJIYA KURDISTANA IRAQE

L. Braidwood, Digging beyond the Tigris, London-New York 1959; R. J. Braidwood û

Dûmahî heye



Xarite: Türken, Kurden und Iraner seit dem Altertum, Egon Von Eickstedt, Stuttgart 1961. Dîtineke giştî: Indo-jermanîbûna zimanî ya Anatolya Rojhilatê, Kurdistan û Iranê, di sedsala lîn berê mîladê de.

Xêzên dirêj: navçeyên çiyayiyên torî-ermenî-kurdî û sînorên kurdî-lorî (Medên kevn, farisên kevn) nîşan didin.

Xêzên veqetayî: sînorên welatên îroyîn nîşan didin. bajarê kevnar. bajarê nuh.

# NAVÊN KURDÎ

M. FERZEND BARAN

-II-

## Navên Keçan

### C

Cinisrî, Ciwangul, Colemerg, Corî, Cuxîn, Cazya, Cejin, Ceyr, Cincîr, Cindyan, Can, Candar, Canfeda, Catir, Caz, Candilan, Ciwan, Cîhan, Colîn, Corîn, Cobar, Cehdasî, Cengel, Ceyraxan, Cindê, Cancîhan, Canbaz, Canê, Canfiroş, Cawan, Canzar.

### Ç

Çavmiz, Çavnerm, Çavnoş, Çavgumrî, Çavrenge, Çavcorî, Çavgeş, Çavkal, Çavmambiz, Çal, Çalî, Çarbox, Çavagir, Çavbelek, Çirûsk, Çihrezad, Çîrok, Çorîn, Çoxan, Çûng, Çetê, Çilçira, Çinarok, Çinîn, Çira, Çiraxan, Çarbuhar, Çavreşok, Çavron, Çavşeng, Çavgel, Çavxumar, Çeleng, Çem, Çavnazik, Çavnigar, Çavpêrî, Çavrend, Çavciwan, Çavçêlek, Çavjîr, Çavkejal, Çavmest, Çalav, Çapok, Çarbext, Çavbaz, Çirûsî, Çirê, Çîmen, Çopî, Çorê, Çuklîn, Çember, Çevrî, Çinar, Çinêran, Çipirk, Çirator, Çirg, Çavreş, Çavrî, Çavstêr, Çavşîrîn, Çavxweş, Çavzer, Çelkê.

### D

Dilcan, Dildûr, Dilê, Dilfirîn, Dilgeş, Dilhûjên, Dilîstan, Dilkêş, Dilmalîn, Dilnazik, Dilnewaz, Demcorî, Demgeş, Demlav, Demnigar, Dempeyale, Demsor, Demşîrîn, Demvîn, Dercindê, Derhakê, Derkê, Dilagir, Dilanxaz, Dilaşt, Dûr, Dostyar, Dotşa, Dîwan, Dod, Diljîn, Dilevî, Dilfeireng, Dilfeiroj, Dilgir, Dilhûnk, Dilîn, Dilmest, Dilnarîn, Dilnerm, Demciwan, Demdur, Demjîr, Demnazik, Demperî, Demron, Demşeng, Demşox, Deraloş,

Derebon, Dêrîn, Dêrsim, Dilamanc, Dilaram, Dumbelan, Dûrkuj, Doşav, Doxdû, Diyarî, Dost, Devgul, Devjîr, Devnazik, Devnoş, Devşîrîn, Dêmbefr, Dergizîn, Dehkanî, Dengxweş, Derzîlok, Destegul, Deşnê, Devgeş, Dadî, Dahîn, Dapîr, Dareben, Darûxan, Dastan, Demawend, Dilniya, Dilram, Dilreng, Dilron, Dilşîrîn, Diltetik, Diltezîn, Dilvîn, Dilxweş, Direxşan, Dîdar, Dîlan, Dîmen, Dilbaz, Dilber, Dilbijûn, Devjîn, Devkenî, Devnigar, Devperî, Dewlet, Dembijar, Daynarok, Delav, Dergelî, Derya, Destmal, Devagir, Devsaz, Dadmeh, Daman, Daralîng, Dareman, Darya, Dawî, Dîlnigar, Dilnoş, Dilrend, Dilriv, Dilşeng, Diltemiz, Dilter, Dilûcan, Dilxwaz, Dilzar, Dirê, Dîjle, Dîlman, Dîndar, Dilawaz, Dilbend, Dilbest, Dilbirîn.

### E

Erxewan, Evî, Evîn, Ezwa, Endaz, Eredin, Erniwaz, Ebre, Edîl, Edlê, Efşan, Estî, Evîdar, Exster, Elmas, Enîgul, Erkewaz, Erwend, Edê, Edla, Edol.

### F

Firişte, Firyal, Fixan, Fewroz, Fênik, Firemeh, Felek, Fener, Feraşîn, Ferd, Firûzî, Firenî, Fertene, Feyrozxan, Firanik, Falik, Feleknaz, Feramoş, Ferengiz.

# N a v ê n K u r a n

## C

Cadir, Cansmerg, Cangîr, Cano, Cawîd, Ceger, Cegerdar, Cegerşer, Celadet, Cendel, Cengbaz, Cengîn, Cengo, Cengoş, Cergbaz, Cergsoj, Cihel, Cindo, Ciwanşêr, Cihanbexş, Cîhandar, Cîxerxun, Codî, Comerd, Cotçehr, Cotyar, Canbexş, Cane-  
wer, Canguzad, Canro, Cazo, Cegerbir, Cegersoj, Cegerxwîn, Cemşid, Cengawer, Cengî, Cengîzخان, Cengroj, Cengvan, Cergo, Ceyto, Cindî, Ciwamêr, Cixsî, Cîhandad, Cîhangîr, Cobar, Cotkar, Conî, Cotşemb, Covan.

## Ç

Çadirvan, Çalak, Çavdêr, Çavpoş, Çavtêr, Çekdar, Çekvan, Çeleng, Çeper, Çeqel, Çespan, Çewkan, Çiko, Çimhez, Çiro, Çiço, Çiya, Çiyavan, Çolî, Çoyî, Çakbîn, Çarmal, Çavnas, Çavşîn, Çavtîj, Çeko, Çelo, Çemo, Çepo, Çerxo, Çeto, Çeyto, Çilû, Çirçan, Çiçko, Çirpût, Çiyaperist, Çiya-yîk, Çoman, Çusto.

## D

Datbext, Dadga, Dadgo, Dadperwer, Dadyezd, Damay, Daner, Darevan, Darîn, Daro, Dasin, Daxdar, Daxwaz, Delaş, Deqo, Derwêş, Desthel, Destpak, Deştevan, Deştö, Dengîr, Dêran, Dêwane, Dijwar, Dilaram, Dilawer, Dilbar, Dilbijîr, Dildarîn, Dिल्fire, Dilguşad, Dilkul, Dilkovan, Dिल्niya, Dilpak, Dilsoj, Dilawer, Dadbîn, Dadger, Dadperest, Dadwer, Damaw, Dana, Dara, Darûcan, Darko, Daryos, Dawetî, Daxdil, Deban, Demawend, Deron, Desteber, Destko, Destvan, Deştî, Devşêr, Deysim, Dêwalî, Dêwo, Dilagir, Dilasin, Dilazren, Dilbaz, Dildar, Dilêr, Dilgerim, Dilkar, Dilbijar, Dilnerm, Dilovan, Dilreq, Dilşad, Dilşêr, Dilxoş, Dirbas, Dirûşm, Dîno, Dîyar, Duniyawer, Dûman, Dûrokzan, Dilzar, Dirbo, Dirinde, Dîwar, Duçil, Duryan, Dûrbîn.

## E

Ebdal, Efresyaw, Efşîn, Egîd, Ejdeha, Ejî, Endazyar, Entîkyar, Ercumend, Erdebil, Erdeşîn, Erdibeheşt, Erjeng, Evraz, Ezmîr, Ezya, Edan, Efser, Eger, Ehrîman, Ejder, Encam, Encumen, Efsendyar, Erdelan, Erdeşêr, Erdewan, Eres, Erbab, Evro, Eywaz.

## Ê

Ekane, Ekta, Ezdînخان, Ekdil, Ezdîn, Ezdo.

## F

Ferheng, Ferx, Ferzend, Fêhris, Filît, Fireydon, Ferhad, Ferod, Ferodخان, Fer-  
man, Ferxo, Ferzende, Fêrzan, Firamerz, Fireyzûn, Fêrnas, Firodşah, Feryad.



# RÊZANA VEGERANDINA BIYANIYAN

DERWEŞ

Di van salên dawîn de, welatên Ewropa, herweha Belçîka, biryarên nuh distînin, ji bo vegerandina beşekî ji civaka biyanîyan.

Her çend e hin bûyerên nuh, weka bi-cihkirina raketên atomê, bala meriv bêtir bikişîne jî, ev rêzana (siyaset) vegerandina biyanîyan rojî (aktuel) dimîne.

Pêşneyara rêzanî ya vegerandina biyanîyan (ji aliyê wezîrê Edaletê, J. GOL), bi awakî xuya girêdayî mercên civakî û aborî, rewşa rêzanî, zêdebûna békariyê, tengiyên hikumetê, kêmbûna mafê temîna civakî û hwd. ye.

Giraniya mesrefên békariyê û yên temîna civakî pîrr caran wek sucê biyanîyan tê dîtin.

## EV RÊZANA VEGERANDINE JI BO KIJAN BIYANIYAN E ?

Ev yek wê rohnîtir bibe, eger em zanibin li ser kîjan beşê biyanîyan tê axaftin.

Ev biyanî ew in ku ne ji welatekî Yekîtiya Ewropa ne, ku ji salekê bêtir bê kar in, yan jî arîkariya sosyalê werdigrin.

Lê, ev tiştêkî rast e ku biyanîyên bêkar beşekî biçûk in ji tevayîya bêkarên Belçîka, û bitenê %14 ji bêkarên biyanî ne ji welatên ewrupî ne. Ji van %14 jî ne pîrr kes kare ji van mercên nuh yên ku tên meydanê kar bike, diravên xwe wergire û vegere: ne hemî karkerên biyanî ji salekê bêtir bêkar in.

Belçîka ne welatê yekemîn e ku vê rêzana vegerandina biyanîyên bêkar pêşneyar kir û bi cih tîne. Herweha li Hollanda, Almanya Rojava, Swîçra û Fransa jî (her çend e rewşa biyanîyan li wira ne weha xirab e. Li Fransa, li bajarê Monsen-Bareul, 3 endam ji bo meclisa belediyê hatin bijartin. Ev cara pêşîn e ku li welatekî ji Yekîtiya Ewropî biyanî di beledîyan de tê bijartin), ev rêzan bi awayên cihê tê ajotin.

Li Hollanda, vegerandina karkerên biyanî ne mecbûrî û ne bi zorê ye. Hin rêxistinên hollandî û biyanî bi vî karî mijûl dibin. Xebata wan: amadekirina mercên vegerandinê ye. Hikumeta Hollanda, mesrefên vê xebatê dide. Veger bitemamî di destê meriv de ye. Li ser de jî, li wira mafê helbijartinê di beledîyan de

ji biyanîyan re hat dayîn. Ev maf karekî pîrr giring e.

Li Almanya Rojava, vegerandina karkerên biyanî mecbûrî ye. Li wira ev rêzan bûye berdewamî. Eger kar hebe, meriv dikare bimîne, kar nebe, paş demekê (ku ji aliyê hikumetê hatiye nasîn) meriv mecbûr e ji welêt derkeve.

Li Swîçra, rêzana biyanîyan ne hatiye holê. Li wira, biyanîyên bêkar, piştî demekê, bi zorê tê vegerandin, ji ber ku li Swîçra (herweha li Almanya Rojava), mafê rûniştinê û kartên mafê kar girêdayî hev in û ev jî miweqet in. Her du jî girêdayî rewşa kar in: kar nîne, meriv mecbûr e ku vegere.

## DAXWAZÎ JI BO INTEGRASYONE

Rêzana vegerandina beşekî ji biyanîyan li Belçîka (û herweha li welatên din yên Ewropa Rojava) tu pîrs hal nake.

Krîza aborî bi vê rêzanê hal nabe. Ev rêzana xapandinê ye, ji bo televîzyonê ye (ku hin ji merivên siyasî di helbijartinan de bêtir deng kar bikin). Merivên aliyê rast û politisyenên liberal rastiyê ji xelkê vedişêrin.

Di cihê rêzaneke vegerandineke diwar û pêşneyarên kurt-demî de, meriv dikare rêzana integrasyonê (di civakê de cih girtin) , bi paraztina mafên çandî û civakî, weka li Swêd, pêk bîne. Ji ber ku hebûna biyanîyan tiştêkî herdemî û struktural e. Zêdebûna tebîî (ji dewra rawestandina hatina biyanîyan, di salên 67 û 68 de) girêdayî vê hebûnê ye û sedema wê ye. Neslê duwemîn û siyemîn welatê (malbavê) "xwe" nas nakin. Ew li Belçîka mezin bûne. Cihê ku ew tiştêkî jê nas dikin ev der e û ew ji ber vê yekê jî vira dixwazin.

Bîna neslê duwemîn û siyemîn, di demên tatîlên havînî de li welatê "wan" teng dibe. Ji ber ku ew li wira bi awakî zêdetir ji vir, xwe biyanî dibînin.

Meriv nikare bêje ku vegera bidil divê nebe, lê pêwîst e ku meriv karibe ji nuh de vegere Belçîka jî (nîşe: Mafê salekê ku ew temaşe bike ka ew li welatê xwe kare bimîne. Eger ew zoriyan bikişîne, divê ew karibe vegere Belçîka).

Bi rêzana integrasyonê nayê gotin ku giş biyanî li vira bimînin: Xwendekarên biyanî, milteciyên rêzanî, biyanîyên ku

ji bo demeke kurt li vira ne û hwd. li hêviya roja vegeerê ne. Herweha, neslê pêşîn ku di pensyonê (teqa'ud) de ne, dixwazin vegeerîn welatê xwe. Lê, gelo zarokên van kesan jî dixwazin "vegeerîn" welatê "xwe"? Vegera bi zorê kare netîcên ne baş bîne.

Rêzana integrasyonê ya hikumeta Belçîka kare di destpêkê de li hember gotinên ne rast û dijminatîya biyanîyan xebatekê bike û klîmata civakî û psîkolojîk, informasyona çewt û rastiya ku bi awakî negatîf (ne baş) tê bi kar anîn, bixe rewşeke positîf (baş). Nijadparêzî û neheqî xwe bi awakî hişk pêşan didin. Ev yek tesîr li ser jîna rojî ya her du alîyan dibe.

Hikumetên welatên biyanîyan jî ji alîkî ve naxwazin ku welatîyên wan bite-mamî vegeerîn û ew ji vê rêzana vegeerê re bêdil in. Ji ber ku ew dizanin, tişteki weha dovîzan kêr dike. Bi vegera karkerên xwe ewê bikevin nav pirsên giring. Biyanîyên ewha ku bi awakî giştî demokrasîke ji a welatên wan firehtir nas kir, wê zû bi zû nikaribin di bin hişkbûn û zordestiya dewleta xwe bijîn. Ewê ji aliyê çandî û civakî jî zoriyan bikişînin. Ji ber ku ew bû çend sal e li derê welat in; hem ew bixwe, hem jî civaka ku jê hati bûn cida cida hatine guhertin.

Di aliyê mafên civakî de jî - pensyon, diravê bêkariyê - ewê pirsên mezin xuya bibin.

Diravê ku ewê biyanî, ji bo vegera xwe wergirin, bi zorê bes e ji bo mesrefên çûyîne. Tişteki namîne ku bidin Temîna Civakî, di cihê salên hundabûyî ku ne li welat bûn. Rêxistina Saxiyê û mafê pensyonê nînin. Eger ew wan mafan bixwazin wergirin, pêwîst e ku ew buhakî giran bidin. Mafê jîna zarokan dîsa dikeve rewşeke ne xweş. Malbata ku carekê parçe bûye, carek din wê parçe bibe.

#### VEGEREKE ÇAWA ?

Pêwîst e biyanîyên ku ewê vegeerîn welatê xwe, bê zorî û bitenê bi daxwaziya xwe haziriya çûnê bikin. Ji bo vê yekê, meriv kare kursên meslekî bo wan veke. Di alîkî de, diravê ji bo vegera biyanîyan ne bes e. Diravekî baş pêwîst e. Ji ber ku mesrefên vegereke bitemamî, zêdetir ji yê rêvaniyekê ne. Biyanîyên ku herin ne bes neslê pêşîn e. Neslê duwemîn û siyemîn jî mecbûr dibe here. Pêwîst e meriv hesabê wan neslan jî bike, ku ew li vira mezin bûne û vira nas dîkin. Li wira jî ew biyanî ne û hemî tişt ji bo wan xerîb e.

Hikumeta Belçîka kare bi hikumetên welatên van karkeran re kar bike ji bo çaredîtina pirsên vegeerê: Dîtina kar, stendina mafên civakî yê salên buhurî, xebata integrasyona nuh û halkirina pirsên jiyana rojî di dema pêşîn da.



# XEBATA ME

## 30 NISAN

Cêjna lê Gulanê ya Partiya Karkeran a Sosyalîst a Belçîka: Em bi raxistina pirtûk, sîlik û kasetên kurdî beşdar bûn.

## 1 GULAN

Em bi Partiya Komunîst a Belçîka re di rê de çûn, û êvarê, em bi raxistina pirtûkan, beşdar bûn cêjna wê.

## 1 GULAN

Cêjna lê Gulanê a Partiya Kar a Belçîkî. Em bi raxistina pirtûkan beşdar bûn.

## 5 GULAN

Kongra K.S.S.E. li bajarê Leuven. Em bi silavnamekê beşdar bûn.

## 7 GULAN

Kongra O.C.G.B., komela flaman ku bi mafên biyanîyên Bruxelles mijûr dibe.

## 23 GULAN Û 3 HEZİRAN

Rêxistina Défis kampanyeke alfabêtizasyonê (hînkirina xwendin û nivîsînê) ji bo kesên nezan, belçîkî û biyanî, vekiriye. Di van her du rojan de, ev rêxistin xwest ku ji kesên ku bi alfabêtizasyona biyanîyên ku ji Tirkîyê hatine, zanînan li ser gelên Tirkîyê yê cihê û zimanên wan bide. Ji bo vê yekê, komela Info-Türk filmeke-vidêo ya hêja li ser rewşa dijwar a îro li Tirkîyê û li Kurdistanê û li ser dîrok û medeniyeta gelên tirk, kurd,

suryanî û ermenî, nişan da. Piştî wê, endamên çar komelan: Info-Türk, Türk-Daniş, Têkoşer, Philoxène û jinek ermenî, her yek ji wan, li ser kok û xusûsiyetên zimanê xwe axaft û zoriyên wî bi yê fransîzî û flamanî pîvan. Ev her du civîn, ne bitenê ji bo nasandina hemî van gelan û medeniyet û zimanên wan ji Belçîkiyan re, lê ji bo nêzîkirina me di nav me de jî, pirr giring in.

## DI MEHÊ DE CAREKÊ

Komela flaman, Sociale en Kulturele Raad, hemî komelên biyanî û belçîkî ku ji bo mafên biyanîyan, li belediya St-Josse, dixebitin, vedixwîne (dawet dike), ji bo amadekirina platformeke hevrayî (muştêrek) ku bibe bingeha xwestinên me di pêwendiyên me bi berpirsiyarên vê belediye re.

## RADYOYA AZAD

Ji meha Adarê heta nuha, her yekşem, ji seet 12 heta 14, em bi çar zimanan: Kurdî, tirkî, fransîzî, flamanî, diweşînin. Di destpêkê de, em bi erebî jî dipeyivîn, lê ji bo ku karkerên marokî erebiya bêjeyî (edebî) nizanin û ku xwendiyên wan bi fransîzî zanin, me weşanê bi vi zimanî rawestand.

## BEREVKIRINA PIRTÛKAN LI SER KURDAN

- The Kurdish Revolt, 1961 - 1970, Edgar O'BALLANCE, London 1973.

- Hurriti, Fiorella IMPARATI



## 30 NİSAN

Belçika Sosyalist İşçi Partisinin 1 Mayıs kutlama şenliğine, kitap, kürtçe müzik kaset ve plak sergisi ile katıldık.

## 1 MAYIS

Belçika Komünist Partisi ile 1 Mayıs yürüyüşüne ve yürüyüş sonrası yapılan şenliğe kitap sergimiz ile katıldık.

## 1 MAYIS

Belçika Emek Partisinin 1 Mayıs şenliğine kitap sergimiz ile katıldık.

## 5 MAYIS

K.S.S.E. Belçika Şubesi'nin Leuven' deki Kongresine mesaj ile katıldık.

## 7 MAYIS

Brüksel'deki göçmenlerin sorunları ile ilgilenen O.C.G.B'nin kongresine katıldık.

## 23 MAYIS VE 3 HAZİRAN

D.E.F.I.S'nin okuma yazma kursları için başlattığı iki günlük kampanyasında Türkiye'den gelen göçmenlerin alfabetizasyonu ile ilgilenen kişilerden, Türkiye halkları ve dilleri hakkında bilgi verilmesi isteği Info-Türk tarafından Türkiye ve Kürdistanın içinde bulunduğu şimdiki zor durum ve Türk, Kürt, Süryani ve Ermeni halklarının tarih ve medeniyetleri ile ilgili bir vi-

deo-film gösterildi. Bundan sonra, dört örgütün temsilcileri: Info-Türk, Türk-Danış, Têkoşer, Philoxène ve bir Ermeni kadını, kendi dillerinin kökeni ve özellikleri hususunda birer konuşma yaptılar. Bu dillerin Flamanca ve Fransızca ile olan zor taraflarını dile getirdiler. Bu iki toplantı, yalnız bu halkların tarih, medeniyet ve dillerinin Belçikalılara tanıtılması değil, kendi aramızda da yakınlaşma açısından önemli bir gelişim oldu.

## AYDA BİR OLAN EYLEMLER

St-Josse'teki Flaman derneği, Soiaale en Kültürele Raad, göçmenlerin hakları için çalışan tüm göçmen ve Belçikalı örgütleri, ilgili belediye sorumlularından istek arzular da bulunması için ortak bir eylem platformu nu oluşturmak için davet etti.

## SERBEST RADYO

Mart ayından bu yana, her pazar günü, saat 12.00'den 14.00'e kadar dört dilde; Kürtçe, Türkçe, Fransızca ve Flamanca yayın yapıyoruz. İlk başta, yayını Arapça'da yapıyorduk. Fakat, Faslı Arapların, genel Arapça'yı bilmemelerinden, Okuyan kesimin de Fransızca bilmelerinden dolayı, bu dildeki yayını durdurduk.

## KÜRTLER İLE İLGİLİ KİTAPLARIN TOPLANMASI

- The Kurdish Revolt, 1961-1970, Edgar O'BALLANCE, London 1973

- Hurriti, Fiorella IMPARATI



